Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1113 | 1-Mijdar- 2023 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ | nameronahi@gmail.com | 423165

# Li DYE'yê di 8 mehan de 23 karesatên meteorolojîk çêbû

Li Dewletên Yekbûyî yên Emerîkayê (DYE) îsal 23 karesatên meteorolojîk çêbû. Di van karesatan de ji milyar dolarekî zêdetir xisar çêbû.

Îdareya Okyanûs û Atmosferê ya Neteweyî ya DYE (NOAA) ji sala 1980'an û vir ve karesatên meteorolojîk qeyd dike.

Li gorî NOAA'yê ji serê sala 2023'an heta niha 23 bûyerên mezin ên hewayî pêk hatine. Di sala 2020'an de jî 22 bûyer pêk hatibû û bûbû sedem ku herî kêm milyarek dolar xisar çêbibe.

Par jî 18 bûyerên hewayî çêbûbûn û vî tiştî rê li ber xisareke bi qasî 165 milyar dolar vekirîbû. Bahoza Lanê ya li Florîdayê bûbû sedema bi qasî 112 milyar dolar xisarê.

Li gorî NOAA'yê ev karesatên hewayî bûne sedema mirina 253 kesan.



# Neteweyên Yekbûyî li dijî madeyên kîmyewî pîvanên nû danî

Neteweyên Yekbûyî ji bo parastina mirovan û cîhanê ji madeyên kîmyewî yên xetere, pîvanên ewlekariyê yên nû pejirand.

Pîvanên gerdûnî yên nû ku ji bo madeyên kîmyewî yên dikarin zerarê bidin hawirdorê bi rengekî ewle bêne bikaranîn, roja Şemiyê li bajarê Bonn ê Elmanyayê di konferansa Neteweyên Yekbûyî de hatin qebûlkirin.

Dîrektorê Bicihanînê yê Bernameya Hawirdorê ya Neteweyên Yekbûyî (ÛNEP) Înger Andersen got, "Her mirovên li vê gerestêrkê divê karibin bêyî ku bi madeyên kîmyewî nexweş bikeve yan jî dûrî tirsa mirinê divê karibin bijîn û bixebitin."

Beşdaran herwiha Deklarasyona Bonnê qebûl kirin û soza vê yekê dan:"Ji bo jiholêrakirina madeyên kîmyewî yên bi zerar, ji bo pêşîgirtina li bandora van madeyan û li cihên pêwîstî pê heye madeyên kîmyewî bi rengekî ewle hildiberîne, sozê didin."

Pîvanên ku ji aliyê Neteweyên Yekbûyî ve hatin qebûlkirin, ji hilberînê heta bi bermahiyên 28 armancên şênber datînin ber sektorên sereke. Hin ji wan pîvanan ew e ku bazirganiya neqanûnî ya madeyên kîmyewî û bermahiyên wan bêne astengkirin, qanûnên neteweyî bi cih bêne anîn, heta sala 2035'an pestîsît qonax bi qonax ji holê bê rakirin ku di çandiniyê de gelekî xetere ye.

Elmanyayê soz da ku ji bo bicihanîna çarçoveya ÛNEP'ê destnîşan kiriye 20 milyon euro bide.



# Pêşengiha şehîd Herekol a pirtûkan

Birûc Resûl/Qamişlo

**7`emîn Pêşangeha şehîd Herekol a Pirtûkan ku di 28'ê Cotmehê de li hola Zana ya bajarê Qamişlo hatibû destpêkirin bidawî bû. 60 weşanxane beşdarî pêşengehê bûn û 140 hezar pirtûk di pêşengehê de hatine pêşandan.**

Dîwana Wêjeyê, Yekitiya Rewşenbîrên a Herêma Cizîrê, Yekitiya Nivîskarên Kurd ên Sûriyê, Saziya Zimanê Kurdî û gelek weşanxaneyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê tevlî pêşengehê bûn. Li gorî Desteya Çand û Hunerê, armanca wan ji pêşangehê pêşkêşkirina berhemên wêjeyî yên nivîskaran û teşwîqkirina xwendina bi zimanê kurdî ye.

7`emîn Pêşangeha Pirtûkan a Şehîd Herekol bi beşdariyeke berfireh a weşanxaneyan, pirtûkxaneyan, saziyên hunerî û wêjeyî yên heremî û biyanî li Qamişloyê piştî 4 rojan bi dawî bû.

Di pêşangehê de 140 hezar pirtûk bi naverokên cur bi cur û di nav de 14200 serenav hatin pêşandan. Buhayên pirtûkan li gor naverokê, cihê çapkirinê û mezinahiya pirtûkê cuda ne. Her wiha weşanxaneyên biyanî ku ji derve tevlî pêşengihê bûne nêzî ji sedî 75ên

Ji her çar parçeyên kurdistanê, Îmarat, Îraq,Lubnan, Misir, îtaliya û belcîkiya jî tevlî pêşengehê bûn. Di pêşengihê de pirtûkên ku hatin pêşkêş kirin bi zimanê Kurdî, Erebî, Soranî, Îranî, Turkî, Ingilîzî û Firensî û pirtûkên ku hatine wergiran din jî hebûn.



Di derbarê pêşengihê de, endmê komîteya emedekar Alan Abdullah ji rojnemeya me re axivî û got:"Vekirina pêşengehê ji bona gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê serkeftieke mezin e, ji ber ku dewletên dagirker dixwestin kurdan û nasnameya wan tune bikin. Lê îro nivîskar, rewşenbîrên kurd nasnameya kurdan didin nasîn û diparêzin. Her wiha di vê salê de tevgerkî pir aktîf pêşangeh hat lidarxistin û bi beşdarbûna hemû saziyên Rêveberiya Xweser, dibistan û zanîngeh, xwestek û kelecana ji bo xwendinê hîn baştir pêşket.

Alan Abullah wiha axaftina xwe bi dawî kir: "7'mîn pêşengiha pirtûkan a şehîd Herekol piştî 4 rojan bi dawî dibe. Tevlîbunekî xurt ji milê ciwan, zarok, nivîskar û tevahî saziyên rêveberiya xweser û civakê bi giştî ji pêşengehê re hebû. Pêwîste ku em weke gelê Kurd xwedî li ziman, çand û nasnameya xwe derkevin. Em ê, her tim piştgirî bidin pêşxistin û parastina çanda xwe û ji bona ku asta xwendin û nivîsandinê jî hîn bêtir di nava civakê de pêşbikeve.

Sudoku: Bersiv 24

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 8 | 2 | 5 | 1 | 3 | 9 | 7 | 6 | 4 |
| 9 | 3 | 7 | 6 | 8 | 4 | 2 | 5 | 1 |
| 1 | 6 | 4 | 7 | 5 | 2 | 3 | 8 | 9 |
| 7 | 5 | 3 | 4 | 2 | 6 | 1 | 9 | 8 |
| 2 | 4 | 9 | 8 | 1 | 3 | 5 | 7 | 6 |
| 6 | 1 | 8 | 9 | 7 | 5 | 4 | 3 | 2 |
| 4 | 7 | 1 | 5 | 6 | 8 | 9 | 2 | 3 |
| 3 | 9 | 6 | 2 | 4 | 7 | 8 | 1 | 5 |
| 5 | 8 | 2 | 3 | 9 | 1 | 6 | 4 | 7 |

Sudoku:Pirs 25

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | 6 | | 9 | | | | |
| | 1 | 8 | | 3 | | | 4 | |
| 2 | | | | | 4 | 3 | 8 | 5 |
| | 5 | | 4 | | | 7 | | |
| | | | 8 | | 2 | | | |
| | | 2 | | | 1 | | 9 | |
| 7 | 3 | 5 | 1 | | | | | 9 |
| | 2 | | | 4 | | 8 | 1 | |
| | | | | 2 | | 6 | | |

# FERHENGA BIWÊJAN

**Kûçik goştê kûçikan naxwin:**
- Bi heman wateyê.

**Lingê xwe zêde diavêje:**
- Derbasî mafê kesên din dibe.

**Li ser rûnişt:**
- Xwar; ji xwe re bi kar anî; dest danî ser; lê xwedî derket; ji xwe re bir; kir malê xwe.
- Bi zorê dest danî ser.

**Masî masiyan dixwin dibin hût:**
- Dema hin bi zordestiya li hina mezin dibin hingê tê gotin.

**Ma te nanê germ xwariye:**
- Dema yek xurtiyê li hina dike, êrîşî wan dike hingê jê re tê gotin.
(Dema kûçik nanê germ dixwin har dibin)

**Mêrik hat ji newalê bû xwediyê malê:**
- Tişta ne ya wî lê xwedî derdikeve; zordestiyê dike; hem neheq e hem xwediyê heq neheq dike.

**Nahêle çavê xwe veke:**
- Pir dide xebitandin; nahêle bêhna xwe veke; nahêle dinyayê nas bike; pêşiya wî digire.
- Zordestiyê lê dike.

**Nikare xwe di postê xwe de bilivîne:**
- Di binê zordestiyeke pir mezin de ye; pir ditirse.

**Nikare bi yê berdayî, diçe yê girêdayî:**
- Yê bikare li ber xwe bide bi ser wî de naçe, bi ser yê belengaz de diçe.

**Per û baskên wî çêbûne:**
- Zordest e; bitir e.

**Pif dike ewran:**
- Pir hişk e; pir zalim e; rehim di dilê wî de nîne.

**Quloçên wî çêbûne:**
- Bitir bûye; har bûye; zordestiyê dike.

**Seriyan ziwa kur dike:**
- Zordest e; rêveberiya wî pir ne xweş e; dilê wî bi ti kesî naşewite.

**Tepeser kir:**
- Zordestî lê kir; neheqî lê kir; bindest kir; xist bin bandora xwe; çavtirsandî kir.

Teyran tevan bi ser teyrekî de zîrç dikir,
**wî jî bi ser çêlîkên xwe de zîrç dikir:**
- Her kesî neheqî lê dikir, wî jî neheqî li malbata xwe dikir.

**Tola Îskê ji Mûskê hiltîne:**
- Yê pê kirî tiştekî jê re nabêje belaya xwe li yê din dide.

**Xinzîr bi selewatan naçe:**
- Kesên zordest bi hêvî û lavelavê belaya xwe ji mirov venakin.

**Xoz (xwez/beraz) bi selewatan nasekine:**
- Bi heman wateyê.

Xwedê diya mirov dide ser zergûniyan,
**kerê şamê jî berdide serê:**
- Ji bo kesê zordest û hesabê tiştekî neke tê gotin.

**Xwîn ketiye çavê wî:**
- Har bûye; bitir bûye; zordariyê dike.

Xwîna wî li serê wî dikele/xwîna wî li
**ber dikele:**
- Bitir bûye; har bûye.

**Xwîna xwe kiriye kevçik raberî min digire:**
- Li belayê digere; har bûye; aqil di serê wî de nemaye.

**Yê der hat yê hundir qewitand**:
- Zordestî lê kir.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

# Serhildana jinan her dem şoreşa civakî pêk anî ye...(2)



Gelo, cîhanek heye ku mirov bêyî ku berdêlên giran bide, bi awayeke azad tê de bijî?Em hemû baş dizanin ku ev pirseke pir zor û zehmet e û bersiva vê pirsê jî ew qas ne hêsan e. Lewra di hişê mirov de bi xwezayî gelek arîşe û nakokîyan dide çêkirin azadiyeke bê berdêldayîn dibe an na?R-2

# 'Êrîşên dagirkeriyê bandoreke neyînî li xebatên şaredariyê dike'

Hevseroka Desteya Şaredaryên herêma Cizîrê, Aştêr Murad diyar kir ku êrîşên dagirkeriya Tirk li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê astengiyan derdixe pêşiya kar û xebata me. Herwiha Aştêr Murad da zanîn ku pirojeyên şaredariyan berdewam in û rêjeya bidawîkirinê ji sedî 75 pêkhatiye.**R-6**



Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1113 | 1-Mijdar- 2023 | www.ronahi.net/ku/

# PDK'Ê BI KIRYARÊN XWE WÊ NIKARIBE DENGÊ RASTIYÊ BÊDENG BIKE

Ji bo bêdengkirina dengê rastiyê, hêzên PDK'ê binpêkirinên xwe yên li dijî rojnemevanan zêdetir dike û Başûrê Kurdistanê veguherandiye zindaneke mezin. Di 25'ê Cotmehê de hêzên PDK'ê rojnamevan Silêman Ehmed bi idîaya ku derveyî qanûnan tevgeriya ye, revand. Lê Silêman Ehmed bi awayekî fermî û di riya wan de hatibû. Gelo kî dê ji vê idîaya wan bawer bike?**R-3**



# Kobanê sembola berxwedanê ye



Kobanê bûye sembola vîna azad a gelê Kurd û sembola serkeftina başbûnê li dijî xerabiyê. Ji ber ku gel û pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê berdêla vê serketinê xwîna bi deh hezaran keç û xortên xwe yên giranbuha dane. Hezkirin û rêzgirtina ji bo vê berxwedanê, yekîtiyek di nav gelên cîhanê de ava kir, ku gelên demukrat û azadîxwaz xwe deyndarê vê berxwedanê dibînin.**R-5**

# Wêjeya jinê bû rengê jiyan û civakê



Di wêjeyê de çirûskên têkoşîna jinê hatin dîtin û nasîn. Herî zêde cihê jinê di civakê de pir baş diyar bûye. Her wiha bi şoreşa Rojava re pir destkeftiyên mezin bi destxistin û karîbûn rola xwe di her qadê de baş bi cih bîne.R-7

# Bingeha Sîstema saziyên Rêveberiya Xweser Netewa Demokratîk e'

Rûken Ehmed da zanîn ku sîstema rêveberiyê di saziyên Rêveberiya Xweser de li ser bingeha Netewa Demokratîk tê birêvebirin û got, bi felsefeya Rêber Apo û xwerîxistinkirinê wê tevahiya pirsgirên sîstema Rêveberiyê bên çareserkirin.**R-4**





Sed salên Komara Tirkiyê
Farûk Sakik R-5

Erdogan wê wêrankirina Sûriyê bidomîne
Zekî Bedran R-5



Êrişên Dêrazorê ji ruxandina binesaziya herêmê ne qutin
Dilyar Cizîrî R-4

Ziman parçeyek ji têkoşîna jinê ye
Nehîr pale R-2

# Serhildana jinan her dem şoreşa civakî pêk anî ye...(2)

## Gelo, cîhanek heye ku mirov bêyî ku berdêlên giran bide, bi awayeke azad tê de bijî?

**Xecê ŞEN**

Em hemû baş dizanin ku ev pirseke pir zor û zehmet e û bersiva vê pirsê jî ew qas ne hêsan e. Lewra di hişê mirov de bi xwezayî gelek arîşe û nakokîyan dide çêkirin azadiyeke bê berdêldayîn dibe an na? Lewra ji pênc hezar salan zêdetir e ku di Rojhilata Navîn û hemû cîhanê de gelek şerên dijwar pêk hatine. Lê hêjayê gotinê ye ku di encama wan şeran de gelek şoreşên hêja jî pêk hatine. Her çiqas cîhaneke azad bêdayîna berdêlên mezin tunebe jî, lê pêkan e ku mirov cîhaneke demokratîk a azadiya civakî avasaz bike û hemû beşên civakê bi ziman, reng, deng û bi çanda xwe ve bi awayeke demokratîk û azad bi hev re tê de bijî. Jixwe bi hezaran jin û mirovan jî ji bo vê yekê canê xwe feda kirine. Di rastiya Kurdistan, Rojhilata Navîn û cîhanê de gelek mînakên jinên sembol hene. Lewma êm ê di vê nivîsa xwe de jîyana balkêş a sê jinên ku bûne sembolên raperîn û şoreşan destnîşan bikin.

### Berxwedana Dasa Nangelî

Hîndistan di navbera salên 1813-1859an de dikeve bin desthilatdariya Îngîltereya ku ji 550 eyaletan pêk tê. Ji wan eyaletan yek jî eyaleta bi navê Travacor e. Ji ber ku gelê Hîndistanê pir feqîr û di nava qeyran û xizaniyê de bûn, ew weku mirov jî ji aliyê qralê vê eyaletê ve nehatine pejirandin û hemû weku kole û xizmetkar di nava eyaleta qralyetê de jîyana xwe domandine. Lê jîyana ku gel û taybetî jî jinên Hîndistanê ku pê nizanîbûne û hînênebûne yek jî pergal û zagonên qralyetê bûye. Li gor zagona qralyetê civak bi çar beşan hatiye dabeşkirin.

1.Bramînî- Hîndiyên ku rengên wan spî ne, rêveberê qralyetê û mêrên dîndar in.
2.Kshatrîta- malbatên aristokrat, leşker û rêveberên îdarî yên qralyetê.
3.Vaishya- karsaz û cotkar in.
4.Shudra- karker û xizmetkarên qralyetê ne.

Yek jî bi navê “Paryan“ beşeke ji mirovên Hîndistanê ne ku di nava pergal û zagonên qralyetê de weku mirov jî nehatine dîtin û tu mafên wan ên weku aborî, tendûristî û civakî yên hemwelatiyê jî tune bûne. Qralyetê eyaletê li dijî mirov û taybetî jî li dijî jinan zagoneke derewştî û dermirovahî pêk tîne. Ji bo ku jinên qralyetê yên arîstokrat (asîl) û jinên Hîndistanî ji hev cuda were xuyakirin, li ser jinên Hîndistanî pergala “kast” a sudra (meme vergisi) hatiye fars kirine û pereyê baca girtina memê ji jinan hatine girtin. Lewra di wê serdemê de ji bilî jinên qralyetê û jinên malbatên asîtokrat hemû jinên Hîndîstanî cil û berg li ber xwe nekirine û taybetî jî çiçikên wan hemû ji derve tazî bûne. Li gor zagonê leşkerên qralyetê her meh diçin mal bi mal digerên û jinan kontrol dikin ka bedena wan girtîne yan vekirîne!.... Eger ku girtibin wê demê leşker bi xwe dîsa vedikin û di ser de jî pereyê bacê (meme vergisi) ji wan distînin, ji bo nedobariyê wan şîyar dikin û diçin. Yan jî Jinên ku xwestibin cilan li xwe bikin û bedena xwe bigirin wê demê bi salane pereyê baca girtinê dane qralyetê. Mixabin girtina pereyên bacê jî li gor mezinahî yan jî biçûkbûna meme bûye. Eger ku meme mezin be wê demê pereyê bacê jî zêde hatiye standin, eger ku biçûk be wê demê pereyê bacê jî hindik hatiye standin. Ev zagona derewiştî û dermirovahî qralyetê di civaka Hîndistanîyan de dibe sedema gelek arîşeyan û ji ber wê arîşeyê jî gelek bertekên jinan derketine holê û heta hêjayî gotinê ye ku şoreş pêk anîne.

Li gor agahiyên malperên weku (www. Hindistan’da bi dönem vergi olarak “mem vergsi.com, www.kizlarsoruyor. com, meme vergisi: Tarih affetmez seydişehirgündemi.com.) ê şoreşa jinên Hîndîstanê ya li dijî zagona derewiştî û dermirovahî ya qralyetê ya li hember jinan pêk anîbûye, di kesayeta jineke bi navê NANGELÎ de bi pêş ketiye û jinan mafên xwe yên hemwelatiyê wergitine. Agahiyên ku min ji malpêr û derdorên ku di derbarê vê mijarê de xebat meşandine de girtiye hemû jî nêzî hev destnîşan kirine.




Jina çalakvan Nangelî û hemjînê weku gelek malbatên Hîndîstanî di nava xizanî û şertên herî zehmet de jîyana xwe berdewam kirine. Wê û hemjînê xwe bi hev re karkerîya gelek karên qralyetê kirine. Lê ji hêlekê ve jî ji ber baca bedena jinan, wê jî gelek zehmetiyên mezin kêşandine. Her bi hatina leşkeran, destdirêjî û oto-kontrola wan a li ser bedena Nangelî her carê di canê wê de birînek reş dane çêkirin.

Li gor efsaneya çîrokê, rojekê leşker tê wê kontrol dikin û jê re dibêjin, “eger ku tu bixwazî bedena xwe bigirî, dema ku em meha bê werîn divê tu bac û fehîza xwe bi hev re zêdetir bidî me, nexwe em ê te bigirin û îdam bikin”. Nangelî û hemjînê xwe ji ber gotina leşkeran, ne bi şev xew dikeve çavên wan û ne jî bi rojê tebata wan tê. Jiyan li ber çavên wan bêwate dibe. Çend roj dimînin ji hatina leşkeran re Nangelî ji hemjînê xwe re dibêje: “Erê tu hemjînê min î, lê ez bi xwe jî xwedî kesayetek im û ez dixwazin bedena xwe li xwe kêz bikin, biparêzim cilên ku ez dixwazim li xwe bikim û bi bedena xwe azad bijîm”. Gelo tu di rêwîtîyê de bi min re yî? Li gor destan vê çîrokê hemjînê wê bêyî ku bifikire daxwaza wê dipejirînê piştgirîya çalakiya Nangelî dike. Nangelî radibe cilên herî xweşik û şahane li xwe dike û xwe giliyê leşkeran dike. Dema ku leşker tên li deriyê wan dixe, Nangelî bi cilên herî xweşik û şahane ve derî vedike. Dema ku leşkerên wê bi wan cilan ve dibînin û dîn û har dibin û jê re dibêjin, “biçe van cilan ji xwe bike û amadekariya xwe bike em ê te bibin û te îdam bikin.” Li ser gotina leşkeran Nangelî jî diçe odeyê bi “dasê” (Tirpan) her du çiçikên xwe jê dike û tîne radestê leşkeran dike. Leşker li hember çalakiya Nangelî matmayî in. Nangelî ji ber xwînê jiyana xwe ji dest dide û hemjînê wê jî xwe dikuje. Çalakiya Nangelî dibe sedema serhildan û şoreşa azadiya jinan û ya gelê Hîndistanê ya li dijî zagon û pergala deshilatdarîya qralyetê. Êdî qiralyet ji jîyana xwe û ya gel bi fikar dibe û êdî neçar dibe ku zagona xwe biguherîne. Qralyet di sala 1924an de baca bedena jinan bi giştî ji zagonan derdixe û nasnameya hemwelatiyê dide gelê Hîndîstanê. Bêguman ev di encama têkoşîn û berxwedana azadiya jinan a bêhempe de pêk hatiye. Jinên Hîndistanê piştî destxistina maf û azadiyê şûn de roja ku Nangelî çalakî pêk aniye û di kesayeta wê de serhildana jin û gelê Hîndistanê bi pêş ketiye, ew roj weku roja herî pîroz azadiyê pênase kirine û ew di wê rojê de bi bîr anîne. Ew roja bîr anîne ta îro jî bi navê “Mulachîparambu” pîroz kirin.

# Jin bi rêxistina xwe dikare bibe hêza çareseriyê

**Parêzvana mafê jinan Ahlam Abdel Melek diyar kir ku li Filistînê rêxistinbûnek xurt ya jin hem ji bo pirskirêkên civakî, hem jî ji bo tora jinan a navneteweyî girîng e.**

Parêzvana mafên jinan Ehlam Abdel Melek destnîşan kir ku ji bo afirandina hêza veguherîner û şikandina şêwazên hişmendiya mêr ku li her derê serdest e, pêwîstiya bi hêza pêşengtiya jin heye û ev yek bi rêxistinbûna jinan pêk tê.

Ehlam Ebdil Melek got, “Pêwîste jin maf û erkên xwe bizane, çareseriya pirsgirêkên xwe bibîne û piştî nîqaşên dûr û dirêj nêrînek bi dest bixe. Gelek avantajên ku ji aliyê pêşengiya beşdariya jinan ve tê dayîn hene. Ji van ya herî girîng ew e ku ew ji enerjiyên xwe yên ku haya wan jê




tune ye sûd werdigirin. Li gorî Buroya Îstatîstîkan a Navendî ya Filistînê, rêjeya beşdarbûna hêza kar a jinên Filistînî tenê derdora ji sedî 19 e. Ji bo ev rêje em bihêz bikin divê rê hebin.”

### ‘Divê em hişyariyê mezin bikin’

Ehlam Abdel Melek da zanîn ku di bazara kar de gelek jin bi perspektîfa çanda serdest a mêr re rû bi rû ne û wiha got: “Ji bo koka pirsgirêkê rast bê fêmkirin û hişmendiya ku dê perspektîfê biguherîne divê em zêdetir bixebitin. Pêwîste şaneyên jinan derbikevin holê.” Ehlam Ebdil Melek di wê baweriyê de ye ku çareseriya van pirsgirêkan ew e ku jin û mêr, biryarder û siyasetmedar li cihekî bicivin û bi awayekî objektîf li ser wan nîqaşan bikin û li ser esasê têkoşîna li dijî cudaxwaziyê dê çareseriyên guncaw bên dayîn.

### ‘Divê jin bi hêz bibin’

Ehlam Ebdil Melek diyar kir ku divê bi taybetî di qanûnên herêmî û navneteweyî yên têkildarî cudakariya zayendî de guhertin bên kirin, Ehlam Ebdulmelek destnîşan kir ku avakirina rêxistineke ku zextê li biryarderan bike û daxwazên wan pêk bîne. Ehlam Abdel Melek da zanîn ku koalîsyonên femînîst ên salên borî hatin avakirin bandoreke erênî li ser pirsgirêkên jin û zarokên keç kir û bû alîkar ku şert û mercên jiyanê baştir bibin û wiha gotinê xwe bi dawî kir:”Lê belê ev pêşketin hêdî ma. Ne tenê ji bo çareserkirina pirsgirêkên civakî yên herêmî, di heman demê de bi femînîstên li derveyî Filistînê re jî divê şêwazek pêşengiya femînîst a beşdarbûyî were dîtin. Divê qanûnên ku mafên jinan li Şerîda Gazzeyê garantî dikin bên guhertin. Tenê wê demê em dikarin behsa femînîzma beşdariya Ereb li Şerîa Rojava bikin, ji ber ku şert û mercên jinan li van welatan pir dişibin hev.”

## Ji Pênûsa Jin

# Ziman parçeyek ji têkoşîna jinê ye

**Nehîr Pale**

Civaka Kurd ziman çavkaniya hebûna xwe dîtiye û bi riya gotinên pêşiyan û hunerê heyanî aştekî zimanê xwe yê dayîkê dane bikar anîn û parastine.
Pêşiyên Kurd ji bo ziman gotine: ` Ziman dayîk e, ji dayîka xwe şerm neke`, bi vî awayî hewldane ku zimanê xwe yê dayîkê biparêzin.
Ziman ê dayîkê ye ev jî tê wateya ku ziman parastin, dayîne bi kar anîn û pêşxistin parçeyekî girîng ê têkoşîna jinê ye. Di sedsala 19`emîn de piştî ku gelê Kurd dest bi serhildanan kiriye yek ji rêbazê dagirkeran ku li hemberî gelê Kurd dayîne bi kar anîn, ew ji zimanê wan dûrxistin e. Bi taybet dewleta Tirk a dagirker li Bakurê Kurdistanê zarokên Kurd anîne rewşa ku ji zimanê xwe yê dayîkê şerm bikin û bikaranîna zimanê tirkî pîvana pêşketinê diyar kirine. Sûriyeyê jî ji derveyî zimanê erebî destûr nedida ku tu pêkhate bi zimanê xwe baxive û li ser Kurdan bi temamî qedexe kiribû. Bi riya vê polîtîkayê hewl didan ku gelê Kurd ji kokê qir bikin û dawî li hebûna wan bînin.
Dayîkên Kurd di her şert û mercî de zimanê xwe dan bi kar anîn û ji ber zimanê dîtir fêrnebibûn tu maf ji wan re nedihat dayîn. Şensê ku hebûna xwe diyar bikin û xwe bidin îfade kirin ji wan re nedihat dayîn.
Lê yên ku ziman û hebûna gelê Kurd parast dayîkên Kurd in.
Rêber APO di parêznameya Manîfestoya Şaristaniya Demokratîk de dema ku ziman weke têgeh pênase dike gelekî girîngî dide ziman û dibêje ziman daneheva civakî ya zêhniyet, exlaq, his û fikra estetîk e ku civakekê bi dest xistiye û nasnameya hebûnê ye. Her wiha Rêber APO civaka ku ji zimanê xwe yê dayîkê dûrketiye û zimanê dagirkeran bi kar tîne wê weke civakeke nexweş mehkûmê jiyaneke trajîk bimîne.
Li Rojavayê Kurdistanê niha bi hezaran zarokên Kurd bi zimanê xwe yê dayîkê daxivin û dinivisîn in, ev deskeftiyekî mezin ê şoreşê ye. Ji bo ev zarok fêrî zimanê xwe bibin gelek bedel hatin dayîn. Dewletên dagirker her tim êrîş dikin da ku xebatên ziman bidin rawestandin. Hêzên dagirker wê tucarî destûr nedin ku zimanê kurdî pêşbikeve û wê bibin kelem. Lê belê nêzîkatiyên dayîk û bavên ku paşeroja zarokên xwe di dibistanên Rêveberiya Xweser de nabînin û dibezin dibistanên rejîma Sûriyeyê, ziyanekî mezin dide zimanê xwe yê dayîkê û şoreşa Rojava. Ji bo zarokên wan xwendina rejîma Sûriyeyê bikin her tiştî didin ber çavên xwe û wan rênakin dibistanên Rêveberiya Xweser. Ev malbat îxanetê li dîrok û têkoşîna ji bo ziman hatiye kirin, dikin û wê tucarî neyên efû kirin.
Jin wê çawa têkoşîna ziman bike?
Gelek rêbaz hene ku jin têkoşîna ziman bike. Êdî ne tenê ziman biparêze her wiha pêşbixîne. Mînak paşeroja zarokên xwe di fêrbûyîna zimanê Kurdî de bibîne, dayîkên nizanin bi zimanê xwe bixwînin û binîvsînin ew bi xwe jî fêrî zimanê Kurdî bibin. Di nava civakê de kesekî nizanibe bi zimanê xwe bixwîne û binîvsîne neyê qebûl kirin û helwest jêre were deynin.



# Wêjeya jinê bû rengê jiyan û civakê

Di wêjeyê de çirûskên têkoşîna jinê hatin dîtin û nasîn. Herî zêde cihê jinê di civakê de pir baş diyar bûye. Her wiha bi şoreşa Rojava re pir destkeftiyên mezin bi destxistin û karîbûn rola xwe di her qadê de baş bi cih bîne.

**Birûc Resûl/Qamişlo**

Wêje hunereke bi pêşveçûna xwezaya mirovahiyê re pêşketiye. Hunerek e ku mirovahiyê xwe pê îfade dike û bi rêka wêjeyê jiyana xwe bedew dike. Wêje şêwazeke vegotinê yê gihandina hemû pêvajoyên dîroka çandî û jiyana mirovan a civakî ye. Lewre bi rêka vegotina wêjeyê mirovahiyê serpêhatî û nirxên xwe parastine.
Rola jinê di wêjeyê de bi qasî ya di jiyanê û pênesekirina wê de ye. Di pêngavên civakî yên destpêkê de û heta niha jî rola jinê çawa di pêşketin û komkirinên nirxên civakî de bêhampa be, di wêje û pêşdebirina wê de jî heman rengî ye. Ti pêşketinên jiyana civakî bê wêje mayende nebûne. Lê belê heke em di roja îro de tenê tiştên nivîskî bigirin dest, wê demê dîroka berxwedan û têkoşîna mirovahiyê çawa ji bo pêşdebirina jiyanê û parastina nirxên mirovahiyê timî têkoşiya ne. Jinê timî cihê xwe di nav de bi rola pêşengtiyê girtiye. Lewre rola jinê di wêjeyê de di asta berpirsiyartiya parastin û bedewkirina jiyanê de ye.
Rola herî zêde jî dikeve ser milê jin; divê ku bi wêjeyê şikil bide hîs û hişê civakê. Divê civakê bide fikirandin. Di nava wêjeyê de jin dê weke netewê, çand û hebûnê bi wêjeyê bide mayîndekirin. Dema ku



jin rola xwe di wêjeyê de nelîze wê demê dê wenda bibe û bê jibîrkirin û dîroka hebûna civakîbûna jinê dê wenda bibe. Dema ku jin têkoşîna jiyana azad bike, divê ku di nava wêjeyê de rola sereke bigire ser milên xwe. Di wêjeya Kurdî ya devkî de rola jinê gelekî xurt e.
Derbarê rola jinê di wêje de û bi taybet di warê wêjeya kurdî de berdevka Dîwana Wêjeyê ya Bakur û Rojhilatê Suriya yê Narîman Evdikê ji rojnemeya me re axivî.

**‘Hijmara wêjevanên kurdî di demên berê de kêm bûn’**

Narîman Evdikê balkişand li ser jinên demên berê û jina kurd heta çi astê cihê xwe di qadên wêjeyê de digirt û çi rolî dileyist û wiha got: “Em di dema berê de tune bûn, lê hijmarên pirtûkên ku jinên wêjevan û nivîskarên demên berê di destê me de hene. Li ser riya van pirtûkan me nivîskarên jin yên di demên berê de naskir û me dît ku hijmara wan şiqas kêm bûn. Em nivîskarin û lêkolînê dikin ji bona aliyên jinên wêjevan û nivîskarên berê, bi van lêkolînan jî em dixwazin dîroka jinên wêjevan derxînin ronahiyê. Her weha mirovên vê demê kêm pirtûkan dixwînin û kêm lêkolîna dîrokê dikin û ez bawerin gelek kes hene hîn nivîskarên berê baş nasnakin. Mînaka herî nêz Mestûra Xanim ne her kesî wê nasdike, heya ku bighêje pirtûka Mestûra Xanim wê gelek pirtûk di ber çavên wî re derbas bibin, heye ku bigihêje kar û xebatên Mestûra Xanim di qada wêjeyê de wê bi gelek kesên wêjevan û nivîskar re bikeve nava danûstandinê. Heyanî sala 1980’ê jî hejmara nivîskarên bi zimanê kurdî dinvîsînin kêmbûn.

**‘Astengiyên nivîskarên dema berê’**

Narîma wiha berdawamî da axaftina xwe û got: “Ji beriya neha jinê nedikarî hest û derbirînên xwe bi rengekî rehet bîne ser ziman û xêzbike. Ji ber ku li pêşiya jinê gelek astengî û sînor hebûn û carcaran jî dibe ku ji bona ku van sînoran derbasbike jiyana xwe jî ji dest bide û her tim jî bi tirs û xof tevdigeriya. Gelek nivîskarên jin ên di dema berê de, nvîsên xwe di rojname, kovaran de ne bi navê xwe dinvîsandin û belavdikirin. Angu nivîsên ku belavdikirin bi navê zilaman dihate weşandin. Ji ber ku di wê demê de tirsekî pir



mezin ji dewletên dagirker hebû.”

**‘Bi şoreşa Rojava re jinê pênûsa xwe azad kir’**

Narîman diyar kir ku bi şoreşa Rojava re jin di qada wêjeyê de û di hemû qadan de û bi rengekî aktîftir cihê xwe girti û tevlî bû û got: “Bi şoreşa Rojava re jin ne tenê di qada wêjeyê de cih girt, herwiha di hemû qadan de cihê xwe girt û tevlî kar û xebatê bû. Wekî volkankî teqiye û beriya her tiştî jin li xwe vegeriya, bi bawerî û îradeyekî mezin tevdigere. Di heman demê de ji bo jinên wêjevan û nivîskar bi şoreşa Rojava re derfetekî pir mezin li pêşiya wan vebû û bi şoreşê re asta nivîsandin û xebatên wêjeyî li Rojava hîn bêtir pêşket û dengvedana tekoşîna jinê gihişte tevahî cîhanê û bû pêşenga hemû jinên cîhanê. Em jin êdî bi rengekî azad, serbest kar û xebatên xwe bê tiris dikin û me cihê xwe hîn baştir di nava civakê de git.”

**‘Pêwîste jin sînoran ji bona xwe nasneke’**

Narîman Evdikê axaftina xwe wiha bi dawî kir: “Bi şoreşa Rojava re gelek derfet û destkeftî ket destê me. Her wiha civaka me ne civaka berê ye ku êdî jinê qebûl neke, ji ber ku jinê bi ked û tevlîbûna xwe xwe daye qebûlkirin. Lê em weke jin pêwîste ku em xwe nexapînin û gavên ji wisa zêdetir bavêjn û bibin alîkar ji jinên ku pêwîstiya xwe bi alîkariyê re heye. Ji milekî din ve jî em wekî jin piştgiriya hemû jinên cîhanê dikin ku bi hest û pênûsa xwe deng û rengê xwe belavê cîhanê bikin. Her wiha daxwaza min jî ew e ku jinên ku ji nivîs û xwendinê hezdikin, bile ji bona xwe tu astengiyan qebûl nekin.”

# Zarokekî bendewar

**Cûdî Ibrahîm**

**Cara yekem çavê xwe vekirin, nedikarî bihizire û biaxife û nizane kî ye? Li ser vê rewşa wî çend sal derbas bûn, di Tv’iyê de rêçeke rêwiyan ku bejna wan şewqa azadiyê difûre, gelo kîne? Ji kur hatine? Û neviyên kê ne? Ev pirs di mejiyê wî de şax veda.**

Di wan dîmenên ku li Tv derdiket, wî ew pirs ji bavê xwe kir û got “ bavê ev kî ne ? bav jî bi rûyekî ken ku weke bêje ev xwedavendê parastinê ye li dora wî û bi baweriyekê got, ev Gêrîlayên me ne. Em Kurdin, lê Kurdistana me Mêtîngere, bavo Gêrîla kî ne? Gêrîla weke Xaltiyên tene, weke Şîlana Berxwedêre, di çavên wî yên bi çûk de baweriyeke mezin bû Di wê kêliyê de dîsa pirsî, bavo ma wê rojekê Gêrîla bên mala me? Bavê bi baweriyeke mezin got” ma gêrîla zarokê mene wê bên û herin, lê tiştekî ez ji te dixazim, dema hatin tuyê ji kesîre nebêjî. Ji ber ku dijminê xedar wê wan



bigrin. Bi gotina dijmin di çavê wî de tirsek bû, bavo dijmin kî ye? ew dijminê ku Kurdistan dagir kirinî ye. Tenê ev gotin bi minre kir.
Temenê wî 5 salî ye, piştî ku lîstoka xwe bi zarokê Kolanê re bidawî kir, kete malê, dengê lorîneke ku bi xwere laş dilerzîne tê, ji xwere got “ya xweda ev lorîn çiye ku ewqasî canê min lerizand” di nava wî û wê lorîkêde tenê ew derî hebû ku bikaribe û bizanibe ew kî ye. Wî ew derî bi tiliyên xwe yên biçûk vekir, dît ku dayîka xwe ye, wêneyê xwedavenda jin di dest de ye û dilorîne. Dayîka wî ew kir hembêza xwe û lorîna xwe berdewam kir. Ji ber giriyê dayîka wî ya ku mîna barana zivistanê dijwar dibariya, ew hêsir ji wan çavên bedew weke sûlavekê ji asîman dirjiya xwarê. Yadê ev Xaltiya min Şîlan e, dayîka min bi kezebşewatekê ji min re got er ê.
Ya xweda çi bedewe, çi por dirêje, di wê çûkaniya xwe de li wêneyê dinhêrî, weke tuyê bêjî bi salane hev nas dikin û bendewariya riya hevin. Di wê kêliyê de wî ew wêneya Şîlan maç kir û da ser eniya xwe, weke qorana pîroz danî ser eniya xwe.
Êdî wî tişt nas kirin û kete dibistana Rêjîma Sûriyê, di dibistanê de refa yekem dixwand. Di êvareke bi baran de min dît sê kesên bedew, por hûnandî ketin mala me, ev kî ne? Ji wêneyê ku dayîka wî nîşanî wî da, zanîbû ku yek ji wan xwedavendan xaltiya xwe ya dine. Di nava pora wan ya hûnandî de hilma azadiyê, kîn û bendewarî xuyadikir. Di wê kêliyê de eger ez xwedî qanad bama ezê ber bi asîmanê heftan ji ber kêfxweşiyê ve bifiriyame. Minê rûyê Şîlana bedew maçkirina û bigota” Te spas dikim ku tu bûyî pêşeng.
Ew kêliya ku wî li çavên wan hersê xwedavendan dinêrî, bi aramiyekê hîs dikir, yek ji wan her û her pê weke dergûşekî şa dibû û dikir hembêza xwe, di wê kêliyê de min dît nava paçika di berîka wê de çend wêneyê wê hebûn. Wî bi dilnizmiyekê ew wêne xwest, ew jî bi dilxweşiyekê ew wêne da wî. Bi kenekî xweş ku dilê wî rihet kir ew hembêz kir, çi cîhane ez têde me, heta hetayê wî ew wêne kiribû destê xwe û weke hevalekê pêre digeriya. Kûde diçû yan di berîka wî de yan jî di destê wî de bû, pêre diaxifî weke tuyê bêjî ew li bere û dizane çi dibe. Di wê wêneyê de wî bi hêzeke nayê pênasekirin hîs kir, ta roja îro jî ew wêne weke hevalekê ye pêre di berîka wî de ye, kuda diçe pêre diaxifî û hembêz dike.
Min ji ahûremazda û ber deriyê wî yê ronî de hêviyek xwest ku cara dawiyê ez xwediyê wêneyê bibînim, weke xaltiya xwe yê nedîtî hembêz bikim û çavê xwe bi bejna wê ya nûr jê difûre tijî bikira.
Sal derbas bû û dem jî çû, her kêlî di jiyana wî zarokî de, bi hêvî derbas dibû. Vaye ez Kurdim û zimanê min heye, Şoreşa Rojava ew gihand wê hêviya wî, di wan kêliyên ku êdî her tiş dizanîbû de, êdî li hemberî wê tarîtiyê rabû û çû, bi kuda çû kes nizane.

# Welatiyên Şehbayê di bin topbaranê de berhemên zeytûnên xwe kom dikin

Herêma Şehbayê weke herêma Efrînê bi mewsima zeytûn û fistiqan tê naskirin. Ji ber êrîşên dagirkeriyê îsal berhemên zeytûnan gelek zirar dîtin û hemwelatiyan beriya dema komkirinê mecbûr man kombikin.

**Vîndar Roj/ Şehba**

Êrîşên dagirkeriya Tirkiyê û dorpêça hikumeta Şamê bûye weke kirasekî qirkirin û talankirinê û li tavahî herêmê xwe pêçandiye. Di encama van siyasetan de gel di zehmetiyên jiyanî re derbas dibe. Mewsima zeytûnan weke jêderekî sereke ya hemwelatiyên herêmê ye, û dema komkirina wê gelek hesase. Lê ji ber êrîşên dagirkeriyê gelê herêmê mecbûr man ku beriya dema wê berhemên zeytûnan kom bikin. Ev yek jî yekser bandora xwe li ser berhmdayînê dike û dihêle ku welatî zeytûnan ji beriya dema wê jêbikin.

Têkildarî mewsima zetûnan li herêma Şehbayê hevserokê komîteya çandiniyê ya Şehba û Efrînê Ferhad Dade û hemwelatiyê bi navê Îman Omer ji rojnameya me re axivîn.

**'Gelê Şêrawa û Şehbayê ji berhemên xwe bê parin'**

Ferhad di destpêka axaftina xwe de anî ziman ku herêma Şehbayê û gundewarên Şêrawa ji berhemên xwe yên zeytûnan bê parin û wiha got:"Zeytûn weke berhemeke pîroz tê dîtin û weke çandeke kevnare ku gelê Efrînê bi taybet li ser wê debara jiyana xwe dikin. Herêma Şehbayê jî bi zeytûn û darên fistiqan navdar e, û weke jêdereke bingehîn yê jiyanê tê destgirtin. Lê dagirkeriya Tirkiyê bi êrîşên xwe yên ser herêmê her tiştî talan dike û gel ji berhemên xwe yê çandiniyê bê par dimîne. Her roj dagirkeriya Tirkiyê gundewarên Şêrawa topbaran dike û hemwelatiyên Efrînê û şehbayê nikarin derbasî nava erdên xwe bibin. Ji ber şer û topbarana ku li herêmê rojane tê kirin, gel nikare mewsimê xwe yê zeytûnan berhevbike û gelek welatî ji ber topbarana ji milê





Ferhad Dade



Îman Omer

dagirkerên tirk ve tê kirin şehîd û birîndar bûn.

**'Ji neçarî gel zû zeytûnên xwe berhev dikin'**

Ferhad da zanîn ku gel zû dest bi komkirina berhemên zeytûnan dike û wiha domand: "Zeytûn demeke wê taybet heye da ku bê komkirin, ger beriya dema wê were komkirin wê demê berhema zeytê nayê derketin û bandorê li ser tavahî salê dike. Dorpêça Hikumeta Şamê û astengiyên li pêşiya derbasbûna mazot û semadê ji heremê re, ji milekî ve û êrişên dagirkeriya tirk ji milekî din ve yekser bandoreke neyînî li berhemên zeytûn û fistiqan dike. Ji ber vê rewşê û ji neçarî gelê Şehba û Efrînê di zûtirîn dem de zeytûnên xwe kom dikin.


**'Di bin topbaranê de welatî zeytûnên xwe berhev dikin'**

Hemwelatiyê Efrînî yê ji gundê Aqîbê Îman Omer ji rojnameya me re ev anî ziman: "Zeviyên me yên zeytûnan di xeta sînor de ne, ji bo em zeytûnên xwe kom bikin. Em gelek zehmetiyan dibînin û rewş bi tirs e. Ji ber topbaranên dewleta tirk a dagirker em nikarin bi rihetî zeytûnan top bikin. Salê çend caran em tên nava erdê xwe û jiyna me her tim di xeteriyê de ye."

# 'Êrîşên dagirkeriyê bandoreke neyînî li xebatên şaredariyê dike'

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

Hevseroka Desteya Şaredaryên herêma Cizîrê, Astêr Murad diyar kir ku êrîşên dagirkeriya Tirk li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê astengiyan derdixe pêşiya kar û xebata me. Herwiha Astêr Murad da zanîn ku pirojeyên şaredariyan berdewam in û rêjeya bidawîkirinê ji sedî 75 pêkhatiye.



Desteya Şaredariyên herêma Cizîrê ji bo hemû şaredariyên bajar û navçeyan weke deste û komkar e. Ew bi hemû nivîsgehên xwe ve karê xizmetguzarî û pirojeyên cuda ji bo gel dike. Îsal vê desteyê bi hevkariya hemû şaredariyên herêma Cizîrê pilannameya kar û xebatên xwe ya salane weke her car dan diyarkirin. Êdî li gor derfetên heyî kar û xebat li ser asta herêma Cizîrê meşandin.

Li gor Beşa Serjimarî û Cerdê ya Desteya Şaredariyên herêma Cizîrê diyar kir derket holê ku li ser asta kantona Qamişlo 217 piroje ne û ya Hesekê jî 148 pirojene. Herwiha mesrefa madî ya pirojeyên kantona Qamişlo 2 meliyon û 57 hezar û 658 dolarên Emerîkî ye. Di heman demê de mesrefa pirojeyên kantona Hesekê jî melyonek û 784 hezar û 597 dolar û76 sint e.

Piraniya van pirojeyan, pirojeyên av, çêkirina riyan, vekirina stad û baxçeyan, guhdan bi rewşa ekolojî, paqijî, kanalîzasyonê û hwd…

Armanc ji vî kar û xebata şaredariyên herêma Cizîrê çakkirina rewşa xizmetguzarî û çareserkirina pirsgirêkên gel e. Desteya Şaredariyan a herêma Cizîrê û şredariyên bin sîwana wê de weke her sal dest bi pirojeyan kir.

Lê dema ku ev şaredarî di nav kar û xebatê de bûn êrîşên dagirkeriya Tirk ji wan re bûn astengî û heya astekê rê li pêşiya bidawîkirina pirojeyan hat girtin.

Girêdî kar û xebata şaredariyên herêma Cizîrê, hevseroka Desteya Şaredariyên herêma Cizîrê, Astêr Murad ji rojnameya me re axivî.

**'Êrîşên dagirkeriyê bandoreke neyînî li xebatên şaredariyê kirin'**

Astêr Murad diyar ku êrîşên dewleta Tirk a dagirker hin pirojeyên ku dikevin xizmeta gel de rawestandin û wiha got: "Dagirkeriya Tirk di 4'ê Cotmehê de êrîşên xwe yên hovane li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê pirtir kirin û bandoreke xwe yekser li ser binesaziya herêmê û saziyên xizmetguzariyê kir. Di encamê de jî ziyanên mezin gihandin jêderên bingehîn ên ku civak jê sûd digre. Rêveberiya Xweser jî ji ber vê yekê rewşa awarte ragihand. Weke Desteya Şaredariyan û şaredariyên herêma Cizîrê, em neçar man ku pirojeyên xwe di encama van êrîşan de, taloq bikin. Weke pirojeya ava bajarê Hesekê, ji bo ku pirsgirêka ava Hesekê çareser bibe me dest bi pirojeyeke mezin kir. Ji birojeyên giring ên ku di dema pêşde em ê, li ser wan biseknin jî, kolana hejmarek bîr li navçeya Amûdê bû ku wê av bi riya wan bîran ji bona bajarê Hesekê were gihandin. Lê ji ber van êrîşan ev piroje û pirojeyên riyan û hwd hatin rawestandin. Dewleta Tirk a dagirker bi awayekî hovane êrîşî herêmê dike û gel dike armanc. Em vê yekê bi tûndî şermezar dikin û wê berxwedana me li hember dagirkeriyê heya serkeftinê berdewambe"



**'Ji sedî 75 pirojeyên me pêk hatine'**

Hevseroka Desteya Şaredariyên herêma Cizîrê, Astêra Murad eşkere kir ku rêjeya pirojeyên ku hatine pêkanîn ji sedî 75e û wiha got: "Êrîşên dewleta Tirk a dagirker bandoreke neyînî li ser rewşa herêmê, kar û xebata şaredariyên herêma Cizîrê dike. Lê tevlî ku êrîş berdewam bûn, karên xizmetguzarî yên weke belvkirina avê bi riya sahrîncan û paqijiyê berdewam in. Herwiha pirojeyên din jî bi sedema êrîşên dagirkeriya Tirk hatin rawestiyan, weke pirojeyên beqaya, ziftikirina riyan û hwd… Em niha di rewşeke astengdar de ne, lê dîsa kar û xebata me ji bo pêkanîna pirojeyên heyî berdewam e. Di dema niha de rêjeya pêkanîn û bidawîkirina pirojeyan bi giştî ji sedî 75 pêkhatiye. Herwiha gelek astengî derdikevin pêşiya kar û xebata me. Di serî de êrîş û gefên dagirkiriya Tirk li ser Herêmê û ev yek ji bo kar û xebata ku tê meşandin astengiyeke mezin e. Di encama van êrîşan de binesaziya herêmê ji aliyê av, elektirîk û hwd ji xizmetê derketî ye. Em neçar bûn ku bi awayekî awarte çaksaz bikin û ev yek jî hêzeke diravî ya mezin jê re pêwîste, lewma em ji bo vê pirsgirêkê jî astengiyan jiyan dikin. Lê dîsa kar û xebata me ranewstiyaye û em niha li gor derfeta xwe kar dikin û dixwazin pêdiviyên gelê yê jiyanê dabînbikin."



# PDK'ê ji hêza rojnemevanên azad ditirs e

Ji bo bêdengkirina dengê heqîqetê, hêzên PDK'ê binpêkirinên xwe yên li dijî rojnemevanan zêdetir dike. Herî dawiyê di 25'ê Cotmehê de rojnamevan û edîtorê beşa Erebî yê Ajansa Rojnews'ê Silêman Ehmed li deriyê Sêmalka bêy ku sedemek yasayî hebe ji aliyê hêzên PDK'ê ve hat revandin.




**Navenda Nûçeyan/Qamişlo**

Ji ber kiryarên hêzên PDK'ê û nebûna azadiya karê rojnamegerî û tengkirina azadiyan a li Başûrê Kurdistanê, roj bi roj binpêkirinên li dijî rojnamegeran zêdetir dibe. Rojane ji aliyê hêzên PDK'ê ve binpêkirinên wek, desteserkirina kelûpelên rojnamegerî, lêdan, astengî û revandina rojnamegeran, pêk tê.

Li gor amarên rêxistinên parastina mafên rojnamegeran, roj li pey rojê azadiya rojnamegerî li Başûrê Kurdistanê xirabtir dibe û ew ji bo karê rojnamegeriyê ne qadek bi ewleye. Ji ber ku gelek caran rojnameger ji ber karê xwe yê rojnamegeriyê rûbirûyê gef, lêdan, kuştin û girtinê tên.

Li gor amarên Navenda Metro ya ji bo Parastina Mafên Rojnamegeran, di sala borî de 431 binpêkirin li beramberî 301 rojnameger û xebatkarên çapemeniyê hatine kirin.

Li gor amarên Sendîkaya Rojnamegerên Kurdistanê jî di sala 2022'yan de 73 binpêkirin li beramberî 158 rojnamegeran pêk hatiye.

Li gor rapora Rêxistina Aştî û Azadî ku taybete bi parastina maf û azadiyan, di sala borî de 259 binpêkirin li beramberî 399 rojnamevanan pêkhatiye. Her wiha di rapora duyem a rêxistina nûçegihanan de jî hatiye gotin, 303 binpêkirin li beramberî rojnameger û saziyên çapemeniyê pêkhatine.

Herî dawî di 25'ê Cotmehê de Rojnamevan û edîtorê beşa Erebî yê Ajansa Rojnews'ê Silêman Ehmed li deriyê Sêmalka bêy ku sedemek yasayî hebe ji aliyê hêzên PDK'ê ve hat revandin û heta niha jî windaye. Piştî hefteyekê ji revandina wî, di 30 Cotmehê de bi şev di saetên dereng de Asayîşa PDK'ê ya Dihokê bi daxuyaniyek tije berovajîkirin û nerast belav kir û îtiraf kir ku Silêman Ehmed ji aliyê wan ve hatiye revandin.

Edîtorê beşa Erebî ya ajansa Rojnews'ê Silêman Ehmed roja 1'ê Cotmehê ji bo serdanê çûbû cem malbata xwe ya li Taxa Şêx Meqsud a Helebê. Silêman roja 25ê Cotmehê dema xwest di ser deriyê Pêş Xabûr (Sêmalka) re derbasî Başûr bibe, ji aliyê hêzên PDK'ê ve hat revandin.

Di heman çarçoveyê de Ajansa Rojnews daxuyaniyek da çapemeniyê. Di daxuyaniyê de hat gotin: "Ev hefteyeke rojnamevan û edîtorê beşa Erebî yê ajansa me (Rojnews) Silêman Ehmed ji aliyê Partiya Demokrata Kurdistan (PDK) ve hatiye revandin û heta niha jî windaye. Şeva borî Asayîşa Dihokê eşkere kir ku wan Silêman Ehmed revandiye.

Silêman Ehmed xelkê Rojavayê Kurdistanê ye. Ev pênc salin li Başûrê Kurdistanê dijî û li gel ajansa me de kar dike. Roja 1'ê Cotmehê ji bo taziya babê xwe û serdana malbata xwe bike bi awayek fermî derbasî Rojavayê Kurdistanê bûye. Dema divegere Başûrê Kurdistanê, li deriyê Fîşxabûr (Sêmalka) bêy ku ti sedemek yasayî hebe û ti tiştek diyar bikin, ji aliyê hêzên Partiya Demokrata Kurdistanê ve tê revandin. Ji wê demê ve peywendiya wî li gel me û malbata wî qut bûye. Silêman Ehmed rojnamevanek çalak bû, di nava pênc salan de bêy ku qut bibe bi berdewam kar kiriye. Di heman demî de endamê Yekitiya Ragihandina Azad (YRA) ya li Bakur û Rojhilatê Suriyeyê ye. Hefteyek piştî windabûna Silêman Ehmed, şeva borî asayîşa PDK'ê ya Dihokê bi daxuyaniyek tejî berovajîkirin û nerast gotin ku qaşo revandina rojnamevan Silêman Ehmed 'ne ji ber karên wî yên rojnamevaniye' û bi eşkere gefa cezakirinê li rojnamevan Silêman kirin û îtiraf kirin ku wî revandine. Em weke Ajansa Rojnewsê, tometbariyên nerast yên Asayîşa Duhokê ya PDK'ê bi tundî red dikin û şermezar dikin. Em weke hewldaneke tirsonek ya li dijî dengê azad yê rojnamevan Silêman Ehmed û hemû rojnamevanên azad dibînin. PDK dixwaze vê dozê jî weke doza Girtiyên Behdînanê gel û raya giştî bixapîne û bi tawanên nerewa cezayê girtîgehê yê giran li rojnamevan Silêman Ehmed bibire. Em weke ajansa Rojnewsê vê kiryarê şermezar dikin û daxwaz dikin ku aqûbeta Silêman Ehmed di zûtirîn dem de were eşkerekirin û berdan. PDK ji ewlehî û jiyana edîtorê ajansa me Silêman Ehmed berpirse ."

Derbarê heman mijarê jî, Navenda Metro ya ji bo Parastina Mafên Rojnamevanan têkildarî revandina rojnamevan Silêman Mihemed got: "Em daxwaz ji aliyên peywendîdar ên hikûmeta Herêmê dikîn ku çarenûsa Silêman Mihemed eşkere bikin û bi selametî vegere ser karê xwe."

Sendîkaya Rojnamevanên Iraqê jî revandina rojnamevan Silêman Mihemed Ehmed şermezar kir û xwest demildest çarenûsa wî were eşkerekirin.

Di heman çarçoveyê de Federasyona Rojnamevan û Nivîskarên Serbixwe (Ronus) bi daxuyaniyekê revandina Silêman Mihemed Ehmed şermezar kir û got: "Divê di zûtirîn dem de çarenûsa Silêman Mihemed bê eşkerekirin. Binçavkirina Silêman Mihemed tawaneke li djî azadiya fikir û ramanê ye." . Herwiha CPT'yê jî, banga eşkerekirina çarenûsa rojnamevan Silêman Ehmed kir û got; "Li gor yasayên cîbicîkar, berpirsên Hikûmeta Herêma Kurdistanê pêwîste cih û sedemên girtina rojnamevan Silêman Ehmed ji malbata wî re eşkere bikin."

# Li Herêma Kurdistanê şideta li dijî jinan roj bi roj zêde dibe

**Bûyerên gefxwarin û destdirêjiya li dijî jinan bi rêya torên medyaya civakî û amûrên ragihandinê her ku diçe zêde dibin. Li gorî agahiyên ku hatine bidest xistin, piraniya van dozan bi armanca wergirtina hinek pereyan tên kirin.**



Tundiya li ser jinan ji her temenî, di her kêliyê de, di hemû beşên civakê de, di nav hemû netewe, ol û hemû cîhanê de tê dîtin û heye. Niha hîn zêdetir tundiya devkî û derûnî heye.

Yek awayê tundiya devkî ye, gefên cûrbicûr, gotinên tund, hincetên berdewam, qêrîn û bêrêzî, ferman dayîn, gotinên nebaş, heqaret, nepeyivîna bi wan re, nehiştina dîtina xizm û hevalan û gelek tiştên din hene. Tundiya bi vî rengî îrade û xwebaweriya jinan ya bixwe kêm dike û her tim wan dixe nava fikar, depresyonê û tenêtiyê.

Îro, bi belavbûna amûrên ragihandinê û torên medyaya civakî, li Herêma Kurdistanê gef û tundiya li hemberî jinan zêde bûye. Ev hemû sûcên di meydana elektronîk ankû înternetê de tê kirine û hem jî tundûtîjiya li dijî jinê ye ku hemû cezayên wan cuda ne. Di Yasaya Cezayê ya Iraqê de zagonek taybet derbarê destdirêjî û tundî û tawanên di înternêtê de nîne. Lê dîsa jî wek sûc û ceza tê dîtin. Ew kes li gor benda 452 yan Yasaya Cezayê ya Iraqê ya hejmara 111 ya sala 1969'ê tê dadgehkirin.

Li gorî vê yasayê her kesê ku bi destdirêjî an jî gefên cuda li kesekê bike yan jî bi darê zorê, pereyan ji kesekê wergire yan jî her tiştekê bêyî xweseka kesan wergire, heta heft sal cezayê girtîgehê dê lê were birîn. Eger sûc bi zorê û tundiyê bê kirin, cezayê girtîgehê dikare heta 10 salan bê dirêjkirin.

Herwiha yasaya jimare 6 ya sala 2008'ê ya li ser qedexekirina bikaranîna nebaş ya alavên ragihandinê li Herêma Kurdistanê heye. Li gor maddeya 2, berpirsê tawana gefxwarinê bi telefona destan bi giştî bi cezayê girtîgehê ne kêmtir ji şeş mehan û ne ji pênc salan zêdetir û ne kêmtir ji yek milyon dînar û ne ji pênc milyon dînar zêdetir tê cezakirin.

Herwiha li gorî yasaya hejmar 8 ya sala 2011'an ya Têkoşîna li Dijî Tundûtîjiya Malbatî ya li Ser Jinê, gefan weke tundûtijiyê pênase dike û bi cezayên girtîgehê û cezayê pereyan tê cezakirin.

Yek ji lêkolînerên civakî ku li navenda têkoşîna li dijî tundiyê dixebite û nexwest navê xwe eşkere bike got; "Bûyerên destdirêjî û tundûtijiya li dijî jinan û li beramberî hinek pere zext li jinan kirin gelek zêde bûne."

Herwiha got, divê raya giştî li ser vê mijarê helwestê nîşan bide û rêyên çareseriyê û gavên nû bên avêtin da ku jin êdî nebin qurbaniyên hişmendiya baviksalarî û zextên li ser wan bi gefxwarin û têkbirina derûniya wan û got; "Niha li piraniya aliyên peywendîdar û rêxistinên parastina mafên jinan dikin, ev doza hene û her diçe zêde dibin."

Di civîneke çapemeniyê ya 1'ê Sibata îsal de, Desteya Giştî ya Têkoşîna li Dijî Tundiya li Ser Malbat û Jinê, îstatîstîkên tundiyê yên sala 2022'an eşkere kir û got: "Sala borî 2 hezar û 659 rewşên gefxwarin û destdirêjiya li ser jinan li deverên cuda yên Herêma Kurdistanê hatine tomarkirin."

Ji bo bidestxistina îstatîstîkên îsal yên tundûtijiyê jî, Berdevkê Polîsên Silêmaniyê Serkewt Ehmed axivî û got; "Heta niha îstatîstîk weke sala borî ye û 560 dozên gefxwarinên bi rêya nebaş ya bikaranîna torên medyaya civakî û telefonên destan hene."

Serkewt Ehmed got; "Me ji bo hişyarkirina welatiyan kampanyayek daye destpêkirin û li dibistanan jî xebatên xwe zêde kirine da ku mexdûrên din çênebin."

Berdevkê Polîsên Silêmaniyê Serkewt Ehmed behsa wê yekê jî kir ku bi dehan jinên ku name li pey xwe hiştine hene. Ji ber vê yekê jî mirov nikare bêje ku hemû qurbanî ji ber xirab bikaranîna telefonên destan û torên medyaya civakî ne.

# Bingeha Sîstema saziyên Rêveberiya Xweser Netewa Demokratîk e’

Rûken Ehmed da zanîn ku sîstema rêveberiyê di saziyên Rêveberiya Xweser de li ser bingeha Netewa Demokratîk tê birêvebirin û got, bi felsefeya Rêber Apo û xwerîxistinkirinê wê tevahiya pirsgirên sîstema Rêveberiyê bên çareserkirin.

**Reşo Mihemed/ Qamişlo**

Sîstema ku tevahiya saziyên Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê li ser kar û xebatan dimeşîn in, li ser bingeha projeya Netewa Demokratîk hatiye avakirin. Ev sîstema ku bi destpêkirina Şoreşa Rojava û avabûna Rêveberiya Xweser e bûye bingeh, bi demê re di kar û xebatên aborî, dademendî, siyasî, çapemenî, xizmetguzarî û civakî de pêşxistinên berbiçav afrandiye. Herwiha hewil tê dayîn ku tevahî kêmasî û astengî bên derbaskirin.

Girêdayî sîstema saziyên Rêveberiya Xweser hevseroka Tevgera Civaka Demokratîk (TEV-DEM) Rûken Ehmed ji rojnameya me re axivî

**‘Li ser bingeha Netewa Demokratîk Sîstema rêveberiyê hatiye avakirin’**

Rûken Ehmed da zanîn ku sîstema saziyên Rêveberiya Xweser ji ya tevahiya sîstemên cîhanê cûdaye ya û wiha got: “Sîstma rêveberiyê ya ku îro di nav saziyên Rêvebeiya Xweser de tê meşandin ji ya hikumeta Şamê pir cûdaye. Saziyên hikumeta Şamê li ser sîstema girêdayî dewletê ku ew jî desthilatdar e tê meşandin. Bi vî awayî li cem wan tu têkilî di nav civak û saziyan de tune ne. Dewlet ne bi rewşa civakê dizane, lewma civak rastî glek êş û astengiyan tê. Cudabûna sîstema saziyên me ji yên hikumeta Şamê ew ku sîstema saziyên me li ser fikr û felsefeya Rêber Apo û netewa demokratîk e. Herwiha sîstema hevbeşiya di nav kar û xebatê de ye e, hem jî jin û mêr bi hev re karê rêveberiyê didin meşandin. Di heman demê de têkilî di navbera rêveberî û civakê de li pêş e. Ev tê wateya ku rêveberiya saziyan bi rewş, êş û pirsgêkên civakê dizane û çareser dike.”

**‘Nenaskirina netewa demokratîk, dibe sedema hin şaştiyan’**

Rûken Ehmed diyar kir ku nenaskirina fikr û felsefeya Rêber Apo, nexweşiyan ji bo sîstema rêveberiyê bi xwe re tîne û wiha domand: “Saziyên me li bakur û rojhilatê Sûriyê bi awayekî rojane kar didin meşandin. Ev kar û xebat li ser bingeha felsefeya netewa demokratîk e. Lê di hin saziyan de û kêm caran pirsgirêkin derdikevin holê; Weke bîroqiratiyet û karderenghiştin. Ev ji bo sîstema rêveberiyê weke nexweşî û pirsgirêkan tên hesêbkirin. Ev nexweşî û pirsgirêk jî, ji encama nenaskirin û netêghiştina netewa demokratîk e û ev yek dihêle ku di sîstema rêveberiyê de lawazî derkeve. Zihniyeta van kesên ku netewa demokratîk nasnekirine di bi bandora zihniyeteke girêdayî sîstema desthilatdariyê de ye. “

**‘Pirsgirêkên sîstema rêveberiyê bi riya felsefeya Rêber Apo çareser dibin’**



Hevseroka Tevgera Civaka Demokratîk (TEV-DEM) Rûken Ehmed destnîşan kir ku hemû nexweşiyên heyî yên sîstema rêveberiyê wê bi felsefeya Rêber Apo û xweperwerdekirinê werin çareserkirin û wiha axivî: “ Pêwîste her rêveberek di karê xwe de xwedî hakimiyet be, da ku nebe rêveberekî an jî rêvebereke desthilatdar, divê dilnezm be. Ji ber ku



sîstema rêverberiyê hunereke û divê ew rêveber civak û derdora ku lê kar dike, baş nas bike. Pêwîste rêveberên saziyên me terzê Rêber Apo ji xwe re bikin nimûne. Rêber Apo kar û xebata ku dikir bi plansazkirî bû, wî kar li her derê dida meşandin, lê ew ne li her deveran bû. Ev tê wateya rêxistinkirina kar. Ev yek jî ji ber ku bi rewşa rêxistinê baş dizanîbû û baş kontrol dikir. Êdî em di wê ferqê de ne ku hin pirsgirêkên sîstema rêveberiyê ya weke bîroqiratîk û yên din bi riya terz û felsefeya Rêber Apo tên çareserkirin. Karê rêvebertiyê bi cih û demê ve nayê girêdan, ango dema pirsgirêkek çêbibe divê nebêje ev ne di dema karê min yê destnîşankirî de ye. Lewma divê kesên rêveber bi dem û cihan ve neyin sînordarkirin. Da ku karê civakê bi awayekî dirust were meşandin, pêwîstiya rêveberên saziyan bi xwerêxistinkirin û xweperwerdekirina li ser bingeha fikrên netewa demokratîk heye. “

# Hamas û Tirkiye çiyê hev in?!

**Volqan Elî**

Di 7’ê meha 10’an de Hamasê li ser Îsraîlê êrîşeke xeter pêk anî. Li ser cewhera êrîşê dikare gelek tişt were gotin. Lê ev dibe mijareke cuda. Tenê tiştê were gotin ew e; li hemberê nijadperestî û çavnebariya Îsraîlê, Hamasê bi zêhniyeteke din a nijadperestî û paşverû êrîşa xwe li ser hedefên sivîl pêk aniye.

Hê di ser êrîşa Hamasê re roj derbas nebibûn, Îran derket û got, ‘têkiliya me bi vê êrîşê re tine, lê em Hamasê destek dikin’. Îsraîlê jî ev piştrast kir ku ‘di mijara ku Îran tevlî vê bûyerê bûye de ti delîlên wê yên saxlem tine’. Herweha bi êrîşê re, Hamasê dest bi propagandeya çalakiyên xwe kir. Hamasê jî tiştên dihatin heman wateyê anî ziman ku destên hêzên herêmî tê de tine. Werhasil her hêzê helwesta xwe yan jî bêhelwestiya xwe bi rengekî nîşan da. DYE’yê û Înilîzîstanê keştiyên xwe yên şer şandin herêmê. Ji aliyê dewletên Ereb ve helwesteke ji şerên berê jî kêmtir ji bo Îsraîlê nîşandan. Bi giştî dewletên Ewrûpayê jî li cem Îsraîlê sekinîn. Diyar e Îran û Îsraîl ji hev agahdar in, yanî dizanin dijminên hev in lê wekî ku yek ji yê din re bêje, ‘ez dizanim di binê vê bûyerê de kî heye û vê gavê hedefa min ne tu yî’.

Di vê derbarê de sekna herî balkêş ya Tirkiyeyê bû. Di rojên destpêkê de ji ber tam ne diyar bû kî wê çi bike,



Tirkiyeyê ji bo her du milan banî kir ku aram bin. Lê her ku dem derbas bû aliyê xwe bi temamî diyar kir: Hamas. Hamas çi hêz e. Ji aliyê hêzên hakim ên cîhanê ve wekî rêxistineke ‘terorîst’ tê naskirin. Ji wê zêdetir jî di çaraseriya pirsgirêka Filîstîn û Îsraîlê de hişmendiyek neteweperest, netew-dewletê esas digire.

Hamas, ji aliyê Tirkiyê ve bi fermî hatiye qebûlkirin. Li Tirkiyeyê buro û berdevkên wan heye. Dema ku êrîşa li dijî Îsraîlê hate bihîstin, Bulent Arinç ku avakerekî AKP’yê wisa gotibû; “nan û ava wan em didinê. Çalakiyeke wisa çawa li dar dixin.” Eger hêzek nan û avê bide yekî, ne dûr e ku jê re plan çêbike û aqil bidê. Jixwe gotineke pêşiyên Tirkan heye, dibêje “yê ku nanê gawiran bixwe, şûrê wan bi kar tîne”. Ya din jî piştî şer dest pê kir hemû çapemeniya Tirkiyeyê wekî ku şerê wan û Îsraîlê be, dest bi propagandaya li dijî Îsraîlê kirin. Jixwe dema Hamasê êrîşa li dijî Îsraîlê li dar xist, dewleta dagirker a Tirk li ser serê gelê Bakur û Rojhilatê Sûrî bombe dibarand. Wekî ku mejiyekî ev kiryar ji yek navendê biplankiribû û dimeşand. Ji xwe îhtimal heye ku ev herdû bûyer tesadufek bin. Lê îhtimaleke zeyif e. Tirkiye dixwaze bibe xîlafeta hemû Misilmanan, herî kêm ji gelên herêmê û gelê Ereb re wekî parazvan nîşan bide. Eger ev nebe jî herêm li gorî wan were avakirin.

Çima îhtimaleke zeyif e. Ji ber ku hemû çapemeniya Tirkiye wekî ku artêşa dagirker a Tirk bi Îsraîlê re ketibe şer, li dijî îsraîlê propagandayeke reşkirinê dimeşînin. Ev, ne wekî berê tenê ji bo durûtiyekê ye. Rast e, dewleta dagirker a Tirk, hemû çapemenî û saziyên wê yên fermî û ne fermî durûtiyekê dikin. Di kêliya ku Tayip Erdoxan digo, “ka mafê mirovan, Îsraîl zarok û sivîlan dikuje” de wî bi xwe talîmat dida ku zarok û sivîlên li Bakur û Rojhilatê Sûrî werin kuştin. Lê ya ku Tirkiye bi hemû hebûna xwe dike, niha dijatiya Îsraîlê ye; xewn û xeyala Osmaniyên Nû dibîne. Dixwaze bi hestên neteweyî yên gelê Ereb bilîze, da ku karibe bibe parazvanê civaka Ereb û vê xewna xwe bike rastî. Ew nebe jî, pêşiya yekitiya gelên Ereb û Kurd bigire.

Bi îhtîmaleke bi quwet Tirkiye ji bo ku Hamas êrîşeke wisa bike, ew sor kiriye. Ji aliyê plan û teknolojiyê ve destek kiriye. Lewra, Îran an jî hêzeke din a dijberê Îsraîlê nikare bi hêsanî bikeve Xazeyê û alîkariya Hamasê bike. Dîsa, herî dawî li Xazeyê nexweşxaneyek hate bombekirin. Li navarastê ma. Her du mil diavêjin ser hev. Ev, axaftina Hakan Fidan tîne bîra mirov. Fidanê wezareta Erdoxan digot, “divê em bikevin Sûrî, hincet basît e. Em ê derbasî wî milî bibin û çend rokêtan bavêjin vî milî. Ji te re sedem”. Gelo dixwazin şer gur bikin, da ku Îran bikeve nav şer, şer girantir bibe? Eger ti ji van nebe jî, Tirkiye ji niha ve dest bi hemleyeke dîplomatîk bi dewletên Ereb re kiriye. Yanî sedemek lazim bû, ji bo hemleyekê bike.

Tirkiye ji Erebên Filîstînê re dewletê dixwaze, dizane berjewendiyên dewletan timî nakokiyan diafirîne. Li aliyê din tehamula zimanê Kurdan jî nake. Nakokiya di navbera Îsraîl û gelê Ereb de, ne bi projeya du dewletên cuda lê bi projeya neteweya demokratîk çareser dibe. Du dewlet jî hezar dewlet jî heman tişt e , timî ji bo nakokiyan dibin çavkanî. Timî şer û kuştinê vedixwînin. Vaye rewşa gelê Ereb li holê ye! Zêdetirî bîst dewletên Ereb hene; ti kes naxwaze du milyon Filîstînî bihewîne!

## Êrişên Dêrazorê ji ruxandina binesaziya herêmê ne qutin



**Dilyar Cizîrî**

Di demekê de di serî de çavên cîhana ereban û xelkên rojhilata navîn li şerê di navbera Israîl û Xeza de ye, komên çete yên girdayî hikûeta Şamê careke din ji rojavayê Çemê Firatê êrişî gundên Dêrazorê yên rojhilatê çemê Firatê ku ji aliyê hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) ve têne birêve birin, kirin. Şervanên QSDê vê carê jî bi erka xwe ya parastina herêmê rabûn û bersiva êrişkaran da. Di encamê de 19 çete hatin kuştin û bi dehan birîndar bûn. Balkêşe di heman demê de şaneyên razayî yên DAIŞ’ê li bajarê Şedadê ya başûrê Hesekê êriş li dijê hêzên ewlekariya hindirîn pêk anîn. Li ser malperên girêdayî DAIŞ’ê de hate ragihandin ku wan êriş pêk aniye.

Ev careke din hevkariya hikûmeta Şamê, DAIŞ’ê piştevaniya xwe ji dewleta Tirk digre aşkere diyar dibe. Her çendî di navbera hikûmeta Şamê û dewleta Tirk nakokî hebin jî, lê li ser dijberiya gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê lihevkirinek xurt a di xeta civînên Astana de hatine rêsandin, heye.

Ji ber wê jî êrişa dawî yên li Dêrazorê, tevgera DAIŞ’ê û êrişên ezmanî yên dewleta Tirk û hedefgirtina wan a binesaziya xizmetguzariyê û qutê gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi tu awayî ji hev ne qut in. Ew di bin îdayên cûda dixwazin vê dema çav li rewşa Xezaye ji xwe re qezenc bikin û destkeftiyên herêmê binpê bikin.

Di heman demê de dixwazin şerê xwe yên li dijî Rojava-Bakur û Rojhilatê Sûriyê di çarçoveya şerê li dijî Amerîka û tolhildana ji Hemasê re nîşan bidin. Ew baş dizanin ku Koalîsyona Navdewletî ku bi serkêşiya Amerîka ku bi salane li herêmê ye û gelek bargehên xwe hene, vekirî dibêje ew ji bo şerê li dijî DAIŞ’ê li herêmê û di warên din de tiştekî nîşanî gelê herêmê nadin.

Heger Amerîka hevkariya xwe ya rastî nîşan bida wê rê li ber hikûmeta Şamê ya êrişkirinê girtiba û wê ji bo naskirina fermî ya Rêveberiya Xweser gavên cidî avêtibe. Ya din jî wê herî kêm ji hevkara xwe ya NAOTyê Tirkiyê re gotiba raweste û êrişî binesaziya herêmên Bakurû Rojhilatê Sûriyê neke.

Gelê Bakur û rêveberiya herêmê ya leşekerî û siyasî van rastiyan dizane û li ser esasê xeta sêyemîn ji danîna têkiliyan a bi hemû aliyan re vekiriye, têkiliyên xwe datîne. Vê xetê zemîn ji serketinên dîplomasî, siyasî û leşkerî re vekirine. Ji ber wê jî her çendî koma Astana dixwaze tekoşîna siyasî û leşkerî ya vê herêmê wekî girêdayî hin aliyan nîşan bidin.

Lê gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê di her carê de bersiva hemû aliyan dide û dibêje em parastina xwe dikin, em ne ji bo ti kesî şer dikin. Wê gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê di vê riya xwe ya li ser esasê xeta sêyemîn hîn jî berdewam be. Bê guman di rewşa heyî de ku êdî şerê cîhanê yê sêyemîn hîn zelaltir nîşan dide, wê bêtir serkeftina xeta sêyemîn ku di destpêka şoreşê de pir behsa wê dihat kirin, zelal bibe.



# Kobanê sembola berxwedanê ye

Kobanê bûye sembola vîna azad a gelê Kurd û sembola serkeftina başbûnê li dijî xerabiyê. Ji ber ku gel û pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê berdêla vê serketinê xwîna bi deh hezaran keç û xortên xwe yên giranbuha dane. Hezkirin û rêzgirtina ji bo vê berxwedanê, yekîtiyek di nav gelên cîhanê de ava kir, ku gelên demukrat û azadîxwaz xwe deyndarê vê berxwedanê dibînin. Di serî de serkeftina Kobanê mizgînîbû ji bona gelê Kurd û tevahî cîhanê û cîhan tev li dora vê berxwedanê bû yek deng û piştgiriya xwe ji bona vê roja pîroz raberkir.

**Ayşa Silêman/ Qamişlo**

Piştî Kobanê li gel kantonên Cizîr û Efrînê rêveberiya xwe ya xweser ragihand, Tirkiye û dewletên herêmê hêrs bûn. Bi riya Çeteyên DAIŞ’ê êrîşî kantona Kobanê kirin. Çeteyên DAIŞ`ê di 15`ê îlona 2014`an de ji 3 aliyan ve êrîşî Kobanê kirin. Bi hezaran çete ji tevahî Cîhanê beşdarî şerê li dijî Kobanê bûn. Lê kurd û dostên kurdan li dijî êrîşên Çeteyên DAIŞ’ê li ber xwe dan. Kurdan li vir şerekî dîrokî da meşandin û Kobanê ji çeteyên DAIŞ’ê û hevkarên wê rizgarkir. Şerê dîrokî yê li Kobanê ji tevahî mirovahiyê re bû serkeftina dîrokê. Çeteyên DAIŞ’ê yên ku bûbûn belaya serê gelên Cîhanê li vir têk çûn. Şervanên kurdan li Kobanê 136 rojan berxwedanek bêhempa û dîrokî dane meşandin. Li gelek welatan di serî de li Asya û Ewropa piştgirî dan berxwedanê û Roja 1`ê Mijdarê wekî Roja Piştgiriya Kobanê ya Cîhanê hate ragihandin. Li Kobanê di serî de berxwedana şervanên YPG’ê, YPJ’ê, Burkan Elfirat, gelê Bakurê Kurdistanê, Başur û Rojhilat û tevahî cîhanê bûn xwediyê vê serkeftinê.

Herçiqasî ku dijminê gelê Kurd û mirovahiyê piştgirî dane çeteyan û xwestin ku vîna gelê Kurd û hêviya hemû azadîxwazan bişkînin, lê li Kobanê mirovahî destê xwe da hev û dilê mirovahiyê bi hev re ji bona azadî û serkeftinê lêdida. Ev hemû hêz û bawerî bi xwe re serkeftina hêzên azadîxwaz û demukrat pêkanî û binkeftina hêzên tûndrew û hevkarên wan anî. Li Kobanê rojên dîrokî bi xwîna şehîd û pakrewanan hate xêzkirin û bi rizgarkirina Kobanê re hêviyê milyonê mirovên azadîxwaz pêkhat. Ji ber ku berxwedana Kobanê bû berxwedana mirovahiyê û serkeftina Kobanê jî bû serkeftina mirovahiyê. Lewra di 1’ê Mijdara 2014’an de bi milyonê mirovan li tevahî cîhanê ji bona azadiya Kobanê rabûn ser piyan û bi yek dengî gazî kirin Kobanê wê bi ser bikeve û serkeftin pêkhat. Li gelek dewletên cîhanê meşên girseyî li bajar û bajarokan bi boneya salvegera vê roja dîrokî careke din piştgirî û dilsoziya xwe ji bo Kobanê raberkirin.

Di 1’ê Mijdara 2014’an de hemû gelên cîhanê bi hev re bûn yek û piştgirî dan berxwedana Kobanê. Bi milyonan gelê cîhanê meş lidarxistin û daketin qadan û alên YPG’ê û YPJ’ê rakirin, di bin dirûşmeya şermezarkirina êrîşên çeteyên DAIŞ’ê yên li ser Kobanê, bang li civaka navneteweyî kirin ku destekê bidin berxwedaniya gelê Kurd ji bo ku amadekariyên lezgînî bikin. Di wê roja dîrokî de, xwepêşandanên ji hemû welat, netew, ol û baweriyan daketin qadan û daxuyanî belav kirin û tê de behsa vê yekê kirin; ku roja yekê Mijdarê bibe roja cîhanî ya piştgiriyê bi Kobanê re, û li gorî vê yekê bi milyonan kes li piraniya welatên cîhanê ji bo destekê bidin berxwedaniya Kobanê daketin qadan. Di bin dirûşmeya “Ji bo Kobanê û mirovahiyê li dijî DAIŞ’ê seferberiya cîhanî” hat îlankirin.

Roja Cîhanî ya Kobanê di gihandina şoreşa Rojava ya cîhanê de û veguherandina wê ji bo tevahiya mirovahiyê roleke girîng lîst. Bi vî rengî şoreşa Rojava xurtir kir û di serkeftinên ku heta niha hatine bidestxistin cih girt




û ji bo gihandina têkoşîna gelê Kurd ji hemû hêzên şoreşger û demokratîk ên cîhanê re mîsyonek dîrokî bi cih anîn.

Serkeftina ku li Kobanê hat bidestxistin ji aliyekê ve li pişt vîn û hêza şervanên Yekîneyên Parastina Gel (YPG)û Yekîneyên Parastina Jin (YPJ) û ji aliyekî din ve jî piştgirî û piştevaniya gelên hemû cîhanê bû. Derketina bi milyonan ji çar aliyên cîhanê yên ji bo piştgiriya Kobanê, roleke girîng lîstin. Gelê Kurd roja 1’ê Mijdarê ji bîr nake û di sedsala 21’an de di tekoşîna navneteweyî de dê roleke girîng bilîze. Vê berxwedanê planên Çeteyên DAIŞ’ê û alîgirên wê pûç kirin, Kobanê bi ser ket û hat rizgarkirin. Îro jî Kobanê bûye xwedî mînaka berxwedanê li cîhanê. Ji ber vê yekê nabe ku roja yekem ya meha Mijdarê weke roja piştevaniya Kobanê, tenê ji bo gelê Kurd were naskirin, ji ber ku piştevaniya hemû gelên bindest û gelên Rojhilata Navîn e. Her wiha piştgiriya berxwedana Kobanê tê wateya piştevanî û piştgiriya têkoşîna demokrasî û azadiyê ya gelên Rojhilata Navîn û bi piştevaniya gelên cîhanê, berxwedana Kobanê biserket û tacîdar bû.

Piştî ku gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê li dora Hêzên Sûriyeya Demokratîk kom bûn û projeya xwe ya xweseriya demokratîk pejirandin, ev yek bû sedema tirsê ji bona dagirkeriya Tirk û dest bi êrîşeke nû li ser herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê kir. Bi dagirkirina Efrîn, Serêkaniyê û Girê Spî, dagirkeriya tirk hewl da ku tola têkçûna DAIŞ’ê hildin û rê li ber serkeftinên ku pêkhatine bigre û destkeftiyên ku li Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi destê gel pêkhatine ji holê rake. Kobanê ne tenê ji bo gelê Kurd, lê ji bo hemû gelên cîhanê roleke girîng list û ev berxwedanî û rihê wê hîn jî li hemberî dewleta Tirk didome. Çawa ku Kobanê li berxweda û bi ser ket û bi berxwedaniya xwe bû sempol ji bona tevahî cîhanê û cîhan tev ji bona Kobanê rabû ser piyan û rizgarkirina Kobanê kete rûpelên dîrka mirovahiyê. Wê li hemberî dagirkeriyê û êrişên wê yên qirkirinê her berxwedan û tekoşîn bê navber bidome. Berxwedana rûmetê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê û bi rihê Kobanê û bi hevgirtina cîhanî wê heyanî serkeftinê bidome.

## Erdogan wê wêrankirina Sûriyê bidomîne



**Zekî Bedran**

Erdogan bê ku kes jê bipirse yan jî zextê lê bike got, Hemas ne rêxistinek terorê ye, hêzek a mucahît e. Nûnerên DYE û Îsraîlî bertek nîşanî vê dan. Tê zanîn ku van dewletan ji mêj ve Hemas xistine lîsteya terorê. Li gel vê jî Erdogan çima bi awayek vekirî Hemasê diparêze. Ne kesek wisa ye ku bertekên ji rojava nizane. Lê welatên rojavayî dizanibûn ku têkiliya Erdogan a bi Hemasê re di çi astê de ye. Erdogan hewl dida têkiliyên xwe yên bi Îsraîlê re sererast bike, ji ber wê jî nedixwest pir bi awayek vekirî bi Hemasê re bixweyê. Ewqas. Di aliyê hişmendiyê de Erdogan ji wan ne cuda ye.

Ma Erdogan niha jî El- Nûsraya ku DYE û welatên din terorîst îlan kiriye, li Idlibê naparêz e? Ma artêşa Tirk li Idlibê parastina El- Nûsrayê nake? Li wir bi milyonan kes di bin rêveberiya El- Nûsrayê de ne. El- Nûsra li gorî xwe wan perwerde dike, milîtanan berhev dike. Niha li Efrînê ev rêxistin bibandortir dibe. Ya ku rê ji vê re vedike jî Erdogan e. Yê ku hevkariyê bi DAIŞ, El- Nûsra û çeteyên din, çeteyên bermahiyên van rêxistinan in, di bin navê cuda de birêxistin dike ma ne Erdogan e? Belê. Erdogan bi awayek vekirî Kurdan ji Efrînê û herêmên din ên dagirkirî derdixe. Tunekirina nîjadî dike. Van hêzan li dijî Kurdan û rêveberiya Sûriyê bikar tîne.

Erdogan dibêje, “Li Gazzeyê Filistînî tên qetilkirin. Ji axa xwe tên derxistin. Emê ji bo van kiryaran Îsraîlê teşhîr bikin”. Di demek ku tevahî dewletên Ereban dengê xwe dernaxin de, Erdogan li Stenbolê ji bo Filistîniyan mitîngan çêdike. Nêznebûna Îsraîlê ya ji bo agirbestê û lêxistina Gazzeyê bi tundî şermezar kir. Lê di heman axaftinê de bi dengek bilind got ku dê şerê li hemberî Kurdan tundtir bimeşînin. Di 5’ê Cotmehê de wî bi xwe çavkaniyên jiyana gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê, binerd û sererdê wê bombebaran kir. Piştî wê jî ji bo xeta sînor a Kurd lê ne dagir bike û korîdorek terorê temam bike, diyar kir ku dê êrişên nû pêk bîne.

Erdogan êşên Filistîniyan ji bo armancên xwe yên siyasî bikar tîne. Di wateyek rast de tiştekî nake. Bi qîjewîjê Ereban û gelê Filistînê bedkariyê (suîîstîmal) dike. Dewleteke mezin rêve dibe. Wê bi mitîngan çi bi dest bixe? Ev ji bo Filistîniyan tiştek şênber nayîne. Lê di demek nêz de hilbijartinên herêmî hene. Ev qîjewîj û mitîng di cewherê xwe de ji bo hilbijartinê ne. Divê kesek vê demagojiyê û lîstokan cidî negire.

Erdogan her tiştê ji bo Filistînê li dijî derdikeve, ew bi xwe li Bakur û Rojhilatê Sûriyê dike. Dema Îsraîl dike dibe zalim, dema Tirkiye dike dibe “têkoşîna li dijî terorê! Dijminahiya Erdogan û Baxçelî ya li hemberî Kurdan sînoran nas nake. Li Qadên Parastina Medyayê bombeyên qedexekirî bi awayek rêkûpêk tên bikaranîn. Li gorî zagonên şer tev nagere. Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi SÎHA yan gelek mirov qetil kirin. Heta erêkirin û piştgiriya NATO û DYE yê nebe nikare vê bike. Hêzên rojavayî di şerê Tirkan ê li hemberî Kurdan de piştgirî dan Tirkiyê û sûcên wan ji nedîtî ve hatin. Hem Erdogan deliqandin, hem jî êşên Kurdan kûr kirin.

Erdogan dibêje ku ewê cîhanê li dijî Israîlê rake. Dixwaze cîhan li hemberî qirkirina Kurdan bêdeng bimîne. Di rastiyê de bêdengbûnê jî têrker nabîne. Dibêje bila cîhan piştgiriyê bide da ez bi serê xwe Kurdan tune bikim. Ji DYE û NATO’yê re dibêje hûn hevkarên çawa ne, pêwîste hûn zêdetir piştgiriyê bidin. DYE û NATO ev bi salane her cûre çek û piştgirî da. Rêberê Kurdan, Rêber Apo dane Tirkiyê û pergala Îmraliyê ava kirin. Li gel vê jî Erdogan hîn ne rihet û razî ye.

Erdogan di cewhera xwe de weke Hemas, DAIŞ’ê û Talîbanê ye. Her çendî hewl dide xwe veşêre jî, di encamê de dijsemîtîzm, dijminiya li hember olên din û dijberiya demokrasiyê ya di hindirê wî de derdikeve holê. Erdogan dîroka dagirkeriya xwe weke fetihê bilind dike, armanca wî tevahî herêm girtin e. Erdogan kesayetek evqas faşîst e. Tevahî destkeftiyên Tirkiyê yên demokratîk ji holê rakir. Weke Hîtler rêveberiyek faşîst û zilmkar ava kir. Çawa ku Hîtler Yahûdî û muxalîf tune kirin, jenosît pêk anî, Erdogan jî heman tiştan bi serê Kurdan û hêzên demokrat tîne.

Erdogan dibêje dê êrişên nû yên dagirkeriyê li Sûriyê pêk bîne. Li gel van gef, qetilkirin û sûcan deng ji DYE û Ewropayê nayê. Bi awayek xwezayî ev karê faşîzma Tirk hêsan dike û cesaretê didê. Ji bo rawestandina dagirkerî û êrişan pêwîste hêz û xebatek baş bê kirin. Divê Kurd û Sûriyeyî di çepera xwe de tevahî amedekariyên xwe bikin. Heman demê de pêwîste raya giştî a hindir û ji derve bê agahdarkirin û bixin tevgerê. Bi gotina Erdogan, ji bo cîhanê rakin ser piyan bixebitin. Li hemberî faşîzmê tenê berxwedan û hevgirtina gelan dikare bibe asteng.

## Sed salên Komara Tirkiyê



**Farûk Sakik**

Sed sal di ser damezrandina Komara Tirkiyê re derbas bû. Di avakirina Komara Tirkiyê de Kurdan jî cîh girt. Berî komar were avakirin sozê namûsê dabûn kurdan ku wê hemû mafê kurdan yên netewî bidin wan.

Bi avakirina komarê re ev sozê namûsê hat jibîrkirin. Berevajiyê vê yekê, plana qirkirin, asîmîlasyonê û tunekirina Kurdan xistin meriyetê.

Li dijî van polîtîkayên qirkirina Kurdan serî hilda. Serhildan bi trajediyên mezin bi encam bûn. Kurdistan tar û mar kirin. Wêran kirin.

Dem hat di sala 1978’an de, bi navê PKK’ê tevgerek jî tevlî van serhildanan bû. Pêşî li tunekirina Kurdan girt. Kurdên ku ji nasnemeya xwe dûr ketibûn, asîmîle bibûn; hişyarbûn û bi nasnameya xwe hesiyan. Bi hişyariyê sînorkirî nema di heman demê de, ji bo vegere 100 sal berê û hesab bipirsin têkoşîna xwe didomînin.

Roj hat Rêber Apo ji bo çareseriya doza Kurdistan, modêla Komara Demokratîk pêşniyar kir.

Li vê derê civaka ku xeribî vê sîstemê û ev sîstem nas nedikir li dijî vê yekê derket. Bi demê re di pratîkê de hat îspatkirin. Hilbijartinên 7’ê Hezîrana 2015’an mînaka herî zelal bû. Di sala 2015’an de li Bakûrê Kurdistan azad bû. Rêveberiyên xweser di dest Kurdan de bûn. Bihna Kurdistana ku me xeyal dikir bilindibû. Erê raste hin kêmasî hebûna, lê ev destpêk bû. Bi demê re wê bihatana çareserkirin. Lê dijminatî dewam dikir û êrişî vê sîstemê kirin. Em anha bersiv bidin hin aliyên ku bi israr dixwazin Rêber Apo fam nekin. Dijminê Kurdistana mezin Tirkiye ye. Me heta îro hevoka ‘Dewleta Îranê-Sûrî-Iraq a dagiker’’ nebihîst. Berê jî min gotibû dubare bikim. Tirkiye şefê orkestraya dijminên Kurdistan e. Diviya Bakûr ji bo me esas be.

Ji bo vê yekê em ê vegerin li Tirkiyê li çareseriyê bigerin. Rêber Apo ji bo vê yekê ji vê derê dest pê kir û behsa Komara Demokratîk kir. Piştî demek me dît di paradîgmaya Rêber Apo de behsa sîstema Netewa Demokratîk tê kirin. Heger bala me kişandibe di hemû nirxandinên Rêber Apo de behsa gelan dike. Perspektîfên wî yên çareseriyê ne bi tenê ji bo gelên Kurd, ji bo hemû gelên li ser vê axê dijî ne. Raste dema ku PKK’ê derket dika dîrokê, behsa Kurdistanek serbixwe kir. Bi dem û salan re konjuktora cîhanê hat guhertin. Netewe dewlet bersiv nedidan pirsgirêkên gelên ku di nav dewletên wan de dijiyan. Lê Rêber Apo bi paradîgmaya xwe ya netewa demokratîk bersiv dida van pirsgirêkan.

Baş e, di Kurdistaneke serbixwe de, me yê wan neteweyên ku li Kurdistan dijîn li ku derê bi cîh bikira? Ji xwe bi kurdan re ew netewe jî bi qirkirinek re rû bi rû mabûn.

Divê ku têkoşîneke gelan a hevbeş a li dijî netewe-dewletê hebe. Ka hûn bibêjin di konjoktura şerê Sûriyê de em ê Kurdistanek serbixwe li ku der bi cîh bikin? Rêveberiya xweser sîstema herî baş nîne gelo?

Hin kesên ku PKK’ê û Rêber Apo rexne dikin û dibêjin çima serxwebûnê naparêzin? Van kesan bila ji bîr nekin, hezkirina PKK’ê ya Kurdistan, ji ya wan mezintir e. Ew ji Kurdistanê ewqas hez dikin ku di bedêla azadiya wî de canê xwe didin.

Îroj ev têkoşîn tê dayîn. Komara ku 100 sal e demokratîk nebûye divê were guhertin. Divê soz û peyamên ku bapîrên wan dabûn bi bîra wan were xistin. Divê em vegerin arşîvên sed sal berê, ew soz û peyamên hatine dayin derxin û 100 sal şûnde îro, di sala 2023’yan de pêk bînin.